Parlamenterê Sosyal Demokratan Hultqvist bi Selahattin Demirtaş re

Nêzîkbûna Sosyal Demokratên Swêd û BDP ê

Dûhî li ABF a Stockholmê bi insiyatîfa Sosyal Demokratên Swêd, beşdarbûna BDP ê, hevkariya Palme Center û Kurdocide Watch-CHAK ê li ser ”Rewşa Turkiyê û Pirsgirêka Kurd” semînerek pêk hat. Di nava kesên semînerdar de Selahattin Demirtaş û Nuri Yaman jî hebû. Rêvebirina semînerê ji aliyê siyasetvana navdar ya sosyal demokratan, Evin Çetin ve hate kirin. Çetîn piştî xwendina programê, mafê axaftinê da parlamenterê swêdî Peter Hultqvist. Hultqvist li ser rewşa Turkiyê û pirsgirêka Kurd, bala guhdaran kişand ser qonaxa endametiya Turkiyê ya Yekîtiya Ewropayê û ji Turkiyê xwest ku krîterên Kopenhagenê bi cî bîne û rêz û hurmetê ji mafê bingehîn yên çandên cewaz re bigire. Di dawiya axaftina xwe cî da giringiya serdana BDP ê û got ku, hevdîtina di nava Sosyal Demokratan û BDT ê ji bo têkiliyên xurtir yê pêşerojê giring e. Ji bo xurtbûna têkiliyan em ê bixebitin.

Serokê BDP Selahattin Demirtaş bi giranî li ser çareseriya Pirsa Kurd bi rêya aştiyê rawestiya. Dema lawê Erdogan jî di nava şer de cî bigirta dê pirs bi hêsanî bihata fêmkirin. Lê ji ber zarokên giregirên dewletê di nav şer de cî nagirin, bi êşa xelkê ku zarokên xwe winda dikin, nizanin. Demirtaş li ser dîtina Hultvist, heman helwest nîşan da û wisa axifî: Serdana me û nêzîkbûna sosyal demokratan ji bo xurtkirina têkiliyên pêşerojê giring e. Em ê ji bo xurtkirina têkiliyan xebatên xwe xurtir bikin.

Parlamenterê BDP Nuri Yaman bêhtir li ser pirsgirêkên Kurdên derve axifî. Di dawiya axaftina xwe li ser hewildanên BDP ê ji bo çareseriya pisgirêka Kurd dîtina xwe anî zimên. Axaftina dawiyê ji aliyê endamê Kurdocide Watch-CHAK ê Dr. Nemrud Buyukkaya ve hate kirin. Buyukkaya rapora xwe ya li ser zarokên Kurd di hepsan de xwend. Rewşa 2 700 zarokên girtî, ji dema girtin, îfadegirtin, hepsikirinê ji awira rûhî û fizîkî ve nirxand. Li ser jiyan, xwarin û pirsgirêkên sihetê zaniyarî da. Ji siyasetvanê swêdiyan xwest ku alîkariya zarokên kurda bikin. Bi insiyatîfa swêdiyan gavên giring bêne avêtin ku, li Turkiyê qanûn bêne guhertin û rê li ber nexweşxistina zarokên Kurda bê girtin. Heyeta BDP, îro li meclîsa swêdê, di rêvebiriya berpirdsê komîsyona mafê mirovan ya Turkiyê, Parlamentera sosyal demokratan Anne Ludvigsson ê dê axaftinekê bikin. Heyet her wisa dê bi rêvebiriya Palme Center re rûnin û hevdîtina pêk bihênin. Li ser têkiliyên sosyal demokratan û BDP ê, siyasetvan Evin Çetin dîtina xwe wisa anî zimên: Gavên ku ji aliyê Hultqvist û Demirtaş ve hatiye avêtin, ji bo têkiliyên pêşerojê pir giring e. Ez weke kesek sosyal demokrat, giringiyê didim têkiliyên wisa.

Kurdocide Watch-CHAK

CHAK-Navenda Dokumentasyonê-EuroKurd News